

DÎ DERBARÊ WERGERÊ DE



Şahîn Bekir Sorekllî

Di vê kurtegotarê de mebesta min bi wergerandinê xwe tenê bi wergerandina wêjeyî (berhemên edebiyatê) ve peywendîdar dike.

Wergerandina berhemên wêjeyî ji zimanekî bo yekî din wek pirekê ye ku bi saya wê xwendevanên aliyekî di derbarê taybetmendiyên daniştvanên aliyê din de agehdar dibin. Berhemên hatine wergerandin dibin hacetên nasandina çanda komeke ji mirovan bi endamên komeke din. Carina dikarin roleke giring di pêşvexistina wêjeya civakê de jî bileyizin. Bo nimûne, dema berhemên nivîskarên wek William Şakespeare, Bernard Şaw û nivîskarên dine navdar yên wêjeya îngilizî bi çêweyeke çak bo kurdî bihên wergerandin, bêyî guman ewê bandoreke erênî li wêjeya kurdî bikin. Dema em bikaribin berhemên nivîskarên almanî û yên wek Goethe, Schiller, Heine, Brecht û yên din bi kurdî bixwînin, bêyî guman em dê bi encamê zanebûna xwe derbarê çand û dîroka gelê almanî de dewlemendtir bikin û ji wan sûtê bi dest bixin.

Wergerandina ji zimanekî bo yekî din, mercên xwe hene. Hindek ji wan evên li jêrin:

-Zanebûneke çak bi her du zimanan. Wergêr divêt bi zimanê berhem pê hatiye nivîsîn û bi zimanê ku ewê berhemê wergerîne gelekî baş bizanibe. Helbet wergêrê ferhengan di dema wergerandinê de bi kar bihîne, lê ne mumkine ku mirov tenê bi rêya ferhengan berheman wergerîne. Ji lewre zanebûna bi her du zimanan bi radeyeke bilind giringe da ku wergêr bedew be û nêzîkî orojînalê berhemê be.

-Divêt wergêr xwediyê/a xibret û zanebûna di derbarê her du çandan de be. Wergêrê ku gelê rûsî nenase, di nav wan de nejiyabe û derbarê wan û dîroka wan de nexwendibe, dê nikaribe berhemek bi⁴⁵

rûsî hatiye nivîsîn bi şêweyeke rêkûpêk wergerîne. Wateya/wateyên peyvekê dikare/-in carine di ferhengê de heman wate bin, lê merc û şêweya bikarhanîna wan ji aliyê axivgerên zimanekî de dikarin ji yê bikarhanîna axivgerên zimanekî din cuda bin. Ger wergêr derbarê çanda her du aliyan de ne xwedan zanyarî be, şaşiyên mezin dikarin di dema wergerandinê de cîh bigirin. Nimûne: Di zimanê îngilizî de gotina "Break a leg" carine dihêt bikarhanîn bo hêvîkirina serkevtinê ji kesekî/-ê re. Wergera rasterast bo kurdî eve: **Lingekî xwe bişikêne.**

- Wergerandina herî çak ew wergerandinaye ku rasterast ji zimanekî bo yê din hatiye wergerandin. Dema nivîskarekî îngilizî, bo nimûne, berhemeke Pûşkîn ji zimanê rûsî wergerîne zimanê îngilizî û dûv re nivîskarekî tirk berhema bi îngilizî wergerîne tirkî û li dû vê yekê nivîskarekî kurd berheme ji tirkî wergerîne kurdî, wê demê berhema orijînal bi rê ve hinek taybetmendiyên xwe wenda dike. Bivêt-nevêt berhema di dema wergerandinê de tiştêkî xwe wenda dike. Heger werger ne rasterast be wendabûn zêde dibe. Dema li dûv wergerandina bi du zimanan, yan tew sê zimanan, bigehê xwendevanê bi zimanekî din, guman tê de nîne ku ew dê nema bi tevahî wek orijînalê xwe be.

Wergerandina berhemen ji zimanên din (erebî, tirkî û farisî bo komine ji kurdan ne tê de) hîn di nav kurdan de bi şêweyeke berfireh cîh negirtiyê û wan bi şêweyeke gelemper sûd ji vê yekê wernegirtine. Heger gelekî û ya herî mezin heye ku kêmbûna xwendekaran be di nav kurdan de. Di nav 20-30 salên derbasbûnê de, bi encama zêdebûna kurdan li derve, hejmara berhemen hatinî wergerandin zêde bû. Bêyî guman min hemî berhemen hatinî wergerandin nedîtine, lê di nav yê min dîtîna de hinek hebûn ku min bi xwe kuwalîteya wergerandinê baş nedît. Sedem bi wê yekê ve girêdayî bû, li gor min, ku wergêrê berheme bi zimanekî, yan bi her du zimanan, gelekî baş nedizanibûye. Carine kurdiya berhema bo kurdî hatî wergerandin ji ne kurdiyeke bedew bûye. Sedemeke din heye ku kêmbûna xibreta çandî be. Gotinê naxwaze ku nebûna zimanekî ta radeyeke bilind STANDARD bo kurmancî jî dê rola xwe leyiztibe. Bi hêvî me ku siberoj encamên baştir û bêtir bi kelk bi xwe re bihîne.